

Datum 05.08.2021

NÜKIRÎ Pela agahiyê ya li ser biryarên nû yên ji bo hatina bo Almanyayê

Dêûbavên hêja,

beriya gera betlaneya plankirî em bi vê pela agahiyê ya di derbarê rêbazên nû de agahî didin we, ku girêdayî şertên ji derviyê welêt hatina bo Almanyayê ne. Rêzîknameya Vîrusa Koronayê ya Hatina Welêt ya nû ji 1. Tebaxa 2021an ve ji bo tevahiya Almanyayê bi awayekî wekhev peywira ji bo qeydî, belgeya piştrastkir û karantînayê ji bo tevahiya kesên vedigerin Almanyayê diyar dike. Ev rêbaz ji bo **Ne-Herêma bi Rîsk, Herêma bi Rîska Mezin** ango bi **Cûreyên Vîrusê** ne. Herêman bi rîsk yê „ji rêzê“ ne di nav de ne.

Di dema hatina bo Almanyê de divê hûn hay ji van xalan hebin:

Nû: Ne-Herêma bi Rîsk	Herêma bi Rîska Mezin	Herêma bi Cûreyên Vîrusê
Test- und Nachweispflicht Ji 1. Tebaxa 2021an ve divê tevahiya rêwiyên vedigerin bikaribin belgeyekê hê di dema hatina bo Almanyayê de pêşkêş bikin, bêtî ku li ber çavan were girtin, ka ew kîjan cûreya suwareyê bi kar tînin û ka ew ne ji herêmeke bi rîsk, ji herêmeke bi rîska mezin an jî bi cûreyên vîrusê tên. Wekî belge ev tên qebûlîkirin: encemake negatîv a testê yan jî belgeyê derzîlixwedanê (ji bo vê yekê derzîlixwedana kamilbûyî tê qebûlîkirin, ango herî kê 14 roj li ser derziya dawî re derbas bûne) yan jî belgeyê başbûna ji nexweşiyê piştrast dike (PCR-Test, ku herî kê 28 roj û herî zêde 6 meh kevin e). Agahiyên li ser van daxwazên testê û li ser testên tên qebûlîkirin hûn dikarin li ser malpera RKI bibînin: www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Tests.html Hişyarî: Ji bo zarokên ji 12 salî biçûktir pêdivî bi peywira belgeyê tune ye, lê belê pêdivî bi peywira karantînayê heye, gava ku ew ji herêmeke bi rîska mezin an jî bi cûreyên vîrusê werin.		
		

Postadresse
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefax
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

Straßenbahn
Linie 3,5
Haltestelle
Eduard-Schopf-Allee

KiTa Bremen
Eigenbetrieb
der Stadtgemeinde
Bremen
Geschäftsführer
Wolfgang Bahlmann
Stv. Geschäftsführerin
Petra Zschüntzsch

Deutsche Bundesbank
Filiale Hannover
IBAN
DE09 2500 0000
0025 1015 66
BIC
MARKDEF1250

Steuernummer
60-100-07915

USt-IdNr.
DE322325940

Di dema hatina ji herêmekê ku bi rîska mezin an jî bi cûreyên vîrusê, divê hûn hay ji van xalan hebin:

Herêma bi Rîska Mezin	Herêma bi Cûreyên Vîrusê
Lîsteyên nû yên ji bo herêman bi rîsk li ser malpera Robert-Koch-Institut (RKI) hene: www.rki.de/covid-19-risikogebiete. Guherînan li ser van herêman dê bi derdewamî li lîsteyê werin barkirin.	
Peywira Qeydkirinê Beriya hatinê pêdivî bi qeydkirina hatinê ya dijîtal a li ser www.einreiseanmeldung.de (pirzimanî) heye. Gava tu beriya hatinê herî zêde bi qasî 10 rojan li herêmeke bi rîsk mabî, hingê divê tu vê yekê bikî.	
Peywira Test û Belgeya Piştrast dike Gava beriya hatinê belgeyê derzîlixwedanê an jî başbûna tune be, hingê pêdivî bi testekê heye.	
Achtung: Ji bo vê yekê beriya hatinê pêdivî bi testekê heye, bêtî ku derzîlixwedan an jî başbûna ji nexweşiyê li ber çavan were girtin.	

Herêma bi Rîska Mezin	Herêma bi Cûreyên Vîrusê
Peywira karantînayê Gava hûn li herêmeke bi rîska mezin an jî cûreyên vîrusê mabin, hingê bi gelemperî divê hûn piştî vegeerê bikevin karantînayê.	
Bi gelemperî divê hûn ji bo 10 rojan bikevin karantînayê.	Bi gelemperî divê hûn ji bo 14 rojan bikevin karantînayê.
Rêbaz û kêmkirina dema Karantînayê Ji bo kesên derzî li xwe dane û baş bûne karantîna ne pêwîst e. Piştî agahdarkirina bi riya portala hatinê ya li ser www.einreiseanmeldung.de mirov dikare karantîna xwe yekser biqedîne. Achtung: Bêyî ku peywira testa beriya hatinê li ber çavan were girtin, qedandina pêşdemkî ya karantînayê ya bi riya testa negatîv herî zû 5 roj piştî hatinê pêkan e. Hete hingê divê şertê karantînayê were bicîanîn. Hişyarî: Ji bo zarokên ji 12 salî biçûktir karantîna bêyî peywira testkirinê otomatîk 5 roj piştî hatinê diqede (roja hatinê nayê hesabkirin).	Karantîna nikare beriya dema xwe were qedandin. Her wisa divê kesên baş bûne, derzî li xwe dane û test bûne jî 14 roj di karantînayê de bimînin in. Hişyarî: Peywira karantînayê her wisa ji bo zarokên ji 12 salî biçûktir jî derbas dibe.
Karantîna yekser diqede, gava herêma tu jê hatiye piştî vegera te û beriya ku dema karantînayê biqede êdî li ser vê derê www.rki.de/risikogebiete ne di listeyê de be. Gava ew herêm êdî wekî herêmeke bi rîska mezin an jî bi cûreyên vîrusê newe diyarkirin, hingê ev yek pêk tê.	
Gava septomên koronayê di dema karantînayê de derkevin, ku piştî hatinê demdirêjiya wê hatiye diyarkirin, hingê hûn mecbûr in yekser agahiyê bidin Daîreya Tenduristiyê û teqez bi doktor re pêwendî dênin.	

Îstîsnayên ji peywira karantînayê di qanûna §6 ya Rêzîknameya li ser Hatina Girêdayî Vîrusa Koronayê de diyarkirî ne. Hûn dikarin rêzîknameyê li ser vê bibînin www.bundesgesundheitsministerium.de/coronavirus-infos-reisende. Agahiyên li ser hatinê her wisa bi zimanên cuda jî (www.bundesgesundheitsministerium.de/coronavirus-infos-reisende/einreise-sms-sprachen.html) ji bo we amade ne.

Hûn dikarin agahiyên li ser peywira belgeyê û îstîsnayan li ser pirs û bersivên li ser vê derê www.bundesgesundheitsministerium.de/coronavirus-infos-reisende/faq-neue-einreisevo.html û li ser vê derê bibînin www.gesundheitsamt.bremen.de. Hûn dikarin her wisa rasterast bi riya vê hejmarê 030-346 46 5100 telefonê Wezareta Federal a Tenduristiyê bikin.

Em dixwazin ji te rica bikin, ku tu bi riya îmzeyê xwe erê bikî, ku te naveroka biryarê fam kiriye.

Dêûbav/Lênêrê Qanûnî

Min ji pela agahiyê fam kir

KiTa Bremen
Bremens städtische
Kinder- und Familienzentren

Postadresse
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefax
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

Paşnav, Nav

Tarîx, Îmze (Lênêrê Qanûnî)

Gelek spas ji bo piştgiriyê. Em ji bo we ya herî baş dixwazin. Bimînin di tenduristiyê de.

[Übersetzt ins Kurdische (Kurmanji)]

Stand 05.08.2021